Çîrok

# MAR Û RÊWÎ

## çîrokeke folklorîk

Amadekirin: **MUEYED TEYIB**



Rojekê rêwîyek (rêvingîyek) bi rê de diçû. Dengek hatê. Li ser milê xwe zivirî, dît ku li kêleka rê kevirek wergeryaye ser marekî mezin. Mar dike nake, nikare ji bin kevir derkeve. Dilê mêrik gelekî bi mar şewitî, xwe xwar kir û bi herdu destan kevir ji ser mar wergerand û mar xelas kir.

Dema ku mar xelas bû, di şûna ku sipasî rêwî bike, wî xwe li stuyê rêwî aland û devê xwe bir binê guhê wî û gotê:

– Ez ê bi te vedim!


Rêwî veciniqî û got:

– Ma tu yê çawa bi min vedî? Min anuha tu ji mirinê xelas kir!

Mar got:

– Zêde gotinan neke. Te çi kiribe ne xema min e! Madem tu mirov î, tu dijminê min î, ez ê bi te vedim!

Û devê xwe vekir û xwe pirtir nêzîkî bin çeneya rêwî kir.



Rêwî fam kir ku axaftina bi mar re fayde nake, îcar got:

– Were em ji hinekan bipirsin eger gotin tu bi heq î wê demê bi min vede, tu serbest î.

Mar got:

– Baş e were em ji darhêjîrê bipirsin.

Rêwî û mar çûn ba darhêjîrê û çîroka xwe jê re vegêran (vegotin). Piştî ku darhêjîrê guhdarîya çîroka wan kir, ji mar re got:

– Tu min dibînî? Ez havînê li ser mirovan dikim sî, hêjîrên şîrîn didim wan, digel ku payizê pelên min diweşin, dîsa jî ew bi das û biviran bi min dikevin, ta û şaxên min dibirin û dibin malê dişewitînin. A mirov ew kes in ku dijminê hemû jiyandaran e. Zû pê vede berî ku te bixapîne!

Rêwî hema yekser ji mar re got:

– Ka raweste, raweste! Em ji yekî din jî bipirsin!

Rêwî hîn axaftina xwe temam nekiribû ji wî alî de kerek zirîya.

– Baş e em ê pirsa xwe ji kerê jî bikin.

Rêwî û mar çûn ba kerê. û rêwî dest pê kir çîroka xwe ji serî heta binî ji kerê re got. Ker careka din ziriya û got:

– Ax, axx! Hûn min dibînin, min hemû ciwanî û gêncîtîya xwe gorî (bi qurbana) mirovan kir. Pişta min ji ber barê wan xûz û xwar bûye. Roj tuneye ku min ew û barên wan li pişta xwe nekiribe. Lê çawa ku ez piçekî pîr û lawaz (zeîf) bûm, wan ez berdam çolê. Xwedê zane ya îro yan sibê ez ê rastî revdeyeke guran bêm û ew ê min parçe parçe bikin. A mirov ev e ha! Jiyandareke zordar û bê wefa ye. Ez bi qurbana wan diranên te yên tûj û jehrdar bim, hema nesekine, pê vede!

Di wê gavê de rovîyekî silav da û hat ba wan.


Rêwi hema yekser ji mar re got:

– Ka raweste, em çîroka xwe ji rovî re jî bibêjin hela ew çi dibêje! Ger wî jî weha got, wê demê bi min vede!

Rêwî ji serî heta binî çîroka xwe ji rovî re got û bû gulpe gulpa dilê wî hela ka rovî ew ê çi bibêje.

Rovî piştî ku guhdarîya çîroka wan kir, got:

– Ka rawestin! Divê ku em herin wî ciyê ku te mar lê dîtîye, divê ku ez wî keviri bibînim.







Hersê bi hev re çûn wî cihî, rêwî ew kevirê ku mar di bin de bû nîşanî rovî da.

Rovî ji mar re got:

– Ka were xwarê, xwe li wî ciyê ku tu lê bû dirêj ke ez binêrim!

Mar xwe ji rêwî vekir, hat xwarê û çû wî cihî û xwe dirêj kir.

Rovî ji rêwî re got:

– Ka wî kevirî wekî berê deyne ser pişta mar da ku ez bibînim çawa bû!

Rêwî kevir hilda û danî ser pişta mar. Mar jî wekî berê di binê kevir de asê ma.

Rovî ji rêwî re got:

– De nuha bi rêya xwe de here!

Û ziviri ser mar û got:

– Tu jî di bin wî kevirî de bimîne!

Wexta ku mar dît ku rovî û rêwî da rê, bû hawar hawara wî û got:

– Ka rawestin, bisekinin! Ma hûn ê bi kude biçin? Werin em pirsa xwe ji yekî din jî bikin!

Digel van gotinan, qijikeke reş li ber serê mar venişt û gotê:

– Dev ji wan berde bila ew bi rêya xwe de biçin. Vaye ez li vir im, ez amade me di bin emr û fermana te de me!





Nb 07

Najmaddin Biri